Di sala 1914 an de Osmanîyan Papîrê min ji devera Qamişlo,gundê Çewdara digirin û wî dajon bereya Qevqasê di seferbelikê de ji bo şerrê di navbera Osmaniyan û Ûrusan de,Lewra Bapîrê min dîl dikeve destê Eskerên Ûrus,Piştî ku Osmanî dişikin û Eskerên Ûrus derbasî welatê Serhedê dibin, dikevin bajarê,Agriyê,Erziromê,Mûşê,Bedlîsê,Wanê û hemî bajar û bajarokên bakurr î kurdistanê zeft dikin û şerr bi dawî dibe û dîlgirtiyan berdidin,bapîrê min jî li Qersê dîlê destê eskerên Qeyser e, ew jî tê berdan, lê li Rûsyayê dimîne,Ji ber ku xortekî bedew,berbiçav û qenc,wefadar û rast bû avserekî Ordiya Qeyserî wî dibe cem xwe malê û piştî şêwrê keça xwe didiyê de û karekî jî jê re dibîne heya dibe xwedî mal û kuflet,Lewra zarokên ku ji wan re çêdibin hemî bi navê Rûsî bi nav dikin û bi zimanê rûsî dipeyin,piştî ku bapîrê min diçe ser heqiya xwe kes ji zaroyên û neviyên wî bi kurdî nizanin û jinan ji xalanên xweyî Ûrusan tînin û wiha di civaka Moskoyê de mezin dibin û asmîle dibin ji hêla ziman û çandê ve û ji hêla ol û ayînê ve jî dibin Xiristyanê Ersoziksî û dibin Ûrus û ez yek ji neviyên wî me,lewra timî bi kul û keser Ji min re digot: Lawo ez kurd im,ji berriya Mêrdînê me ,devera Qamişlo û gundê min Çewdara ye,lê çi bi destê min tê??!! Her wiha avserê Moskoyî pêde çû û berdewam kir û got:Lê sed heyf û mixabin ez bi zimanê nijadê xwe nizanim,lewra gelek caran ku ez hin ji kurdan li Sovyetê dibînim pir kêfa min tê û yekser bi wan re diguncim weke ez xwediyekî xwe bibînim! Çiku ez dizanim ku ez ji wî milletî me,û di pirrê caran de jî dema dibe çaxê xeberdana û pirogramên Radyoya Êrîvanê li Qevqasyayê ez lê guhdarî dikim ,tevî ku ez di xeberdanê wan de nagihêjim,lê zehf bi saz û mûzîk û stranên wan ve tême girêdanê,her wiha carcaran jî dema valabûna xwe ez diçim,komarên paş Qevqasê weke: Gurcistanê,Ermenistanê û Azerbeycanê da ku ez kurdan bibînim,tevî ku gelekî ji Moskoyê

dûr in jî lê hezkirina milletê min li cem min her min dikişîne,lê tenê ez kurdnijadim,lê ziman û tevger û jiyana min Ûrusiye. Lewra yê xwendekar got: ji wê rojê de ew î avserî gelekî guh dida min û carcaran ez vexwendî ser xwarinê dikirim û her ji min re digot: Ez dixwazim tu ji min re li ser devera Qamişlo ,nemaze gundê bapîrê min Çewdara bipeyive her wiha carekê ez birim mala xwe jî û nanekî layiq ji min re danî û kufletên malê hemî hatin û ez bi wan naskirin dam û got: Ev xwendekar Kurd e, ji Sûriyayê ye, ji devera Qamişlo ye û sînordarê gundê Çewdara ye,gundê Bapîrê we,lewra em û wî ji yek dever û yek milletî ne ?!

---

(1)Malbata Cum'a ji malbatên xwedî gund û zevî ne di eşîra Mêrsiniyan de û gundên wan di naverasta bajarê Amûdê û Qamişloyê de ev in:

Hasdê,Sorka,Xezalîkê ,Kêstek,Hermê kerenga ,Bîrabazin,Rengo û Olçiya

Jêder: Rûpela Salihê Heydo

Dûmahî : Dilawer Zengî : Dîroka Zar û Zimanê Kurdî

Di warê zaravayên kurdî de kevintirîn çavkanî Şerefnameya Şeref-Xanê Bedlîsî ye. Eşîr û civakên kurdan, ji alî zim-an, gerdiş û rewşa civakî ve bi ser çar beşan de dabeş dike:
1-Beşê yekê, Kurmanc. 2-Beşê didiwan Lor.
3-Beşê sisiyan Kelhur. 4-Beşê çaran Goran.

1. Mehmûdê Bayezîdî -1858-an di nivîsek xwe de dibêje: (kurmanciya xelkê Wanê, Mûşê, Bayezîdê û Qersê û kurmancên bi ser Rûsiya û Îranê ve û zimanê xelkên Botan, Hekariyan, Hemedanê, Simtiyê, Diyarbekirê, Mûsil, heta bighê hundirê Bexdayê (ku ji herêmên Silêmanî û Şarezorê, ji taîfên Zerza, Mukrî, Bebe, û Bilba-san pêk tê) ji hev cuda ne).

Wek diyar e, Bayezîdî, di vê xebata xwe de, kurdî bi navê kurmancî bi nav dike. Wek zarav jî behsa navê Botan, Hekarî û Rewendî dike.
Givrinlî, Di sala 1836-1837-an de, çend gotar li ser ziman û etnografya kurdan belav kirin. Zimanê kurdî bi navê kurdi-ya jorîn û ya jêrîn dike du beş:

Jorîn: Mukrî, Hekarî, Şikakî û Bayezîdî.
Jêrîn: Lurî, kelhorî, Lekî û Goranî.
Oskar man: kurdî bi navê kurdiya rojava, ya Rojhilat û ya Başûr dike sê beş. Oskar man ê ku Zazakî bi ser Goranî ve dihejmêre. Goranî jî vederî zimanê kurdî dike.
Dr. Mac Kanzie: Yê ku Goranî wek zimanekî serbixwe dîtiye, lê kurdî bixwe jî yek ji zaravayên Farisa-navîn dibîne.
Sosyologê Turk Ziya, kurdan bi navê kurmanc, Zaza, Soran, Goran û Lur dike pênc qewm.
Alaedînê Secadî dibêje: Zimanê Kurdî du zaravayên sereke hene:
Zarava Botanî: A ku îro jê re Bahdînî tê gotin. Kurdên Turkiyê, Sûriyê û yên qezayên Mûsilê bi vê zaravayê diaxivin.
Ya didiwan jî zarava Mukrî ye, ya ko îro jê re Soranî tê gotin. Kurdên din, ango kurdên bakurê rojhilat û rojhilatê Îraqê û yên Ardelan û Mukriyan bi vê zaravayê diaxivin.
Dr. Kemal Fuad nerînek dî heye dibêje:
1-Kurdiya Rojava: (kurmanciya jorîn-bakur: Afrîn, Cizîrî û Botanî, Sincarî, Badînî, Hekarî û Şikakî.
2-Kurdiya Rojhilat: (kurmanciya Xwarê-başûr: hin jî dibêjin kurdiya Navendî. Soranî, Silêmanî, Mukrî, Sineyî.
3-Kurdiya Başûr: Xaneqînî, Feylî, Kirmanşanî, Lekî, Kulgayeyî, Kelhurî, Perewendî.
4-Kurdiya Goranî- Zazakî: Hewramanî, Kenûleyî, Gehwareyî, Bocelanî, Zengeneyî.
Dr. Kemal bi rexnegirî dibêje: (Wê zaravaya ku ez jê re zarava Başûr dibêjim hin kes wê bi navê Lurî bi nav dikin).

Fûad Heme Xurşîd: Hem Luriya Mezin û hem jî ya Piçûk kurdî qebûl kirine û ew di nav Kurmanciya Başûrî de hejmartine.
Mehmed Emîn Hewramanî xebatin hêja kirine. Ew di vî warî de dibêje:
1-Kurmanciya jorîn: (Bahdînî).
2-Kurmanciya Navîn: (Soranî).
3-Kurmanciya Xwarê: (Goranî).
Şêweyên Jêrîn- Hewramanî, Lurî- Bacelanî- Zazakî. Weha destnîşan dike ku Bacelanî ji Zengeneyî û Şebekî digire nava xwe.
Malmîsanij dibêje: Pênc zaravayên esasî hene:
1-Kurdiya Bakur (Kurmancî).
2-Zaravaya Kurmancî ya ku li Kurdistana Navîn tê axaftin. Ji vê zarazayê re carna Kurdiya Başûrî (kurmanciya xwarê) yan jî bi Şaşîtî (Soranî) tê gotin.
3-Zaravaya ku bi navên Kirdkî, Kirmanckî-Zazakî yan jî Dimilkî tê zanîn. Ew Zazakî bi du şêweyên sereke dibîne: Dêrsimê û yên Çewlig-Diyarbekir –Sêwregê.
4-Zaravaya Goranî: Hewramî tê bi nav kirin. Nêzîkî (Zazakî- Dimilkî)ye.
5- Grûba zaravayên Kurdî yên din ên ku li Kurdistana Başûrî tên axaftin gelek şaxên vê grûbê yên bi navên Ker-manşahî, Lekkî, Lurrî, Sencabî û Kelhurî hene ku ev ji alî qismek kurdên nav hidûdên Îranê û Îraqê tên axaftin.
Mûrad Ciwan dibêje:
1-Kurdiya Bakurî (yan jî Kurmancî-Kirmancî). Zarava Kurdiya Bakur, Zarava herî berfirehbûyî ye.
a-Kurmanciya Rojava. b-Rewendî. c-Şikakî. Ç-Hekarî. d-Botî. e-Bahdînî. f-Sincarî. g-Kurmanciya Navîn.
2-Kurdiya Navîn (yan jî Soranî): a-Soranî. b-Silêmanî. c-Mukrî. Ç-Sineyî.
3-Kurdiya Başûrî: a-Xaneqînî. b-Lurî (yan jî Feylî). c-Kirmanşahî. Ç-Lekî.
d-Kelhorî. e-Perewendî. f-kulpaviyeyî.
4-kurdiya Goranî: a-Hewramanî. b-Bacelanî.
5-Kurdiya Zazakî (Dimilkî-Kirmancî): a-Dêrsim. b-Çewlig-Sêwregê.

Çavkanî:

– Amed Tîgrîs û Aso Germiyanî. Dîroka Kurd û Kurdistanê.. Stockholm-1990.
– Fûad Heme Xorşîd, Zimanî Kurdî, Dabeşbûnî Diyalektîkaniy, çapxaneyî Afaq Al-arebiye, Bexdad,10985.
-Fûad Heme Xorşîd, Zimanê Kurdî û belavbûna coxrafî ya zarawayên wê. Çapxana Elwîsam, Bexdad, 1983.
-Malmîsanij, Dimilkî miyan di ciyayeya vatişan, Hêvî, Kovara çandiniya giştî, Parîs, no:2,1984.
-Mehmed Emîn Hewramanî, Zarî Zimanî Kurdî le Terazûyî Berwîrd da, 1981.
-Mûrad Ciwan, Zimanê Kurdî, Rojnameya Armanc, hej:135-138,sal:1993.
-Şerefxanê Bedlîsî, Şerefname.

XELAT/ Jêder: dilawerkurdi.wordpress.com

Dilawer Zengî : Dîroka Zar û Zimanê Kurdî

“Ziman mercê heyînê a pêşîn e. Yekbûna Kurdan jî bi yekîtiya zimanê Kurdî çê dibe. Yekîtiya zimanî bi yekîtiya tîpan dest pê dike”. (Celadet Bedir-Xan).
Kurdistan cihê avabûna gelek şaristaniyê yên herî kevnare ye. Li gor zanyarî û agahdariya arkeologan, li Kurdistana Başûr nêzîkî çiyayê Zagrosê rastî şûnewarên gundê Çermo û Şanîdar hatin. Ev gund 6.700 sal B.Z hatiye avakirin. Ev gundê herî pêşîn e, ku li cîhanê ava bûye. Û herweha diyar e ku cara yekemîn bû, ku mirov ji nêçîrvaniyê derbasî çandinî û lawir xwedîkirinê bûne. Berî deh hezar salan li Rojhilata Navîn û bi taybetî li Kurdistanê, di warê çandiniyê de, genim, çewder û fesûlye hatine çandin. Dîsa li vê herêmê lawirên wek bizin, mîh û beraz cara yekemîn hatine kedî û xwedî kirin. Arkeologên Amerîkî, Alman û Turk di sala 1985-an de li Amedê, li dorhêla navça Erxeniyê malek ji bin erdê derxistin. Ev mala ha 9,000 sal Kevin e.
Bêguman dîroka ziman bi dîroka hebûna mirov ve girêdayî ye. Pêşveçûna ziman bi pêşveçûna mirov ve ji hêla rewşa dîrokî, civakî, coxrafî û abûriyê ve tê girêdan. Li gorî zimannasan zimanê Kurdî zimanekî Hindo-Ewropî yê pêşîn e (Proto-Indo-European) û ji malbata Ariyan e. Li gorî dîroknasan ew jî vedigere -5000- sal (B.Z).
Pêşengên pêşîn yên ko bi vî zimanî dipeyivîn ji wan re digotin (Korgan), li navça (Istibsê Ewrasî), ya ko di navbera çemê Folxa başûrî derya Qezwîn û rojhilatî çemê (Ron) û rojavayî çiyayê (Ewrel) dijiyan. Li vê dawiyê, ji wan re hat gotin: Arî. Berî ko ji hev veqetin û li herêma (Ewrasiya) belav bibin, diyar e bi yek zimanî dipeyivîn. Piştî hoz û êlên Ariyan ji hev veqetiyan, li du (qara) belav bûn; ji Hindê-bakurê Asiya ta bi Ewropayê. Piştî vê belavbûn û ji hev dûrketinê gelek grubên ziman ji nav wan kad û şax dan, lê her koka zimanê xwe –Arî- winda nekirin û tev bi zimanên Hindo-Ewropî (Indo-European-Languages) tên naskirin.
Li gorî dîroknasan Gotî 3800 sal B.Z, Zagrosî ne. Ew pêşiyê Kurdan in. Berî xelkên Arî yên pêşî dakevin Zagros û Kurdistana îroyîn, zimanekî Gotiyan serbixwe hebû. Lewra em dikarin bêjin zimanê Kurdî yê pêşîn (Porto-Kurdish-Language) zimanê Gotî bû, yê ko di -1000-B.Z. pê dihat axaftin. Diyar e, di -1500-B.Z de, zimanê kurdî ketibû bin bandûra bêje û gotinên Ariyan. Ango destpêka hatina pêşengên koçên Ariyan li çiyayê Zagrosê (kurdistana îroyîn). Diyar e, ev dem dema koç kirinê ye. Nêzîkî -2000- sal B.Z, xelkên Hindo-Ewropayî ji Qefqasan ve daketin herêma Kurdistana îroyîn. Ji wan Kasî li herêma Zagrosê û Mîtanî jî, li rojavayê wan, li herêma Dîcle û Torosê bi cih bûn. Dema Kasî hatin herêma Zagrosê, li wir, ji berê ve Gotî û Loloyî jî hebûn. Li herêma Mîtaniyan jî Hûrî, Nayrî û Sobartûyî dijiyan. Mîtanî û Kasî, di demekê bi şûn de, li ser gelê herêmê desthilatî kirin. Zimanê xwe yê Hindo-Ewroyî û sîstema xwe ya civakî li ser gelên herêmê dan qebûl kirin. Mîtaniyan tixûbên xwe fireh kirin. Ji rojhilat ve birin heta çiyayê Zagros û gola Wanê, ji rojava ve gehêşt Derya Spî, ji bakur û başûr ve jî, ji Torosan heta axa Suriyê ya îroyîn berfireh kirin. Kasiyan hebûna xwe ya bi rêxistinî heta sala 1.B.Z. domand. Di warê huner û pîşe de, Kasî gelekî pêşketî bûn.
Împaratoriya Medya, dewleta Kurdan a yekemîn û ya herî mezin û berfireh bû. Heta îro yekemîn car e, ku Kurd di nav dewletekê de hemû malbat, êl û herêmên xwe kirine yek. Dewleta Medya, B.Z. di dawiya sedsala 18-an de, di navbera gola Urmiyê, Akbatan û heta çiyayê Zagrosê berfireh bû. Hemedana îroyîn serbajarê Medan bû. Medî zerdeştî bûn. Zerdeşt pêxemberê Kurd û Îraniyan bû. Navê nivîsîna Zerdeşt Avêsta ye. Avêsta li ser çermê lawiran hatiye nivîsandin. Li gorî pirtûkên dîrokî û dîrokzaneyan gotina Kurd gelekî kevn e. Ev gotin, heta B.Z. 2.000 salan diçe. Di wê demê de cîran û dîrokzan her yek li gor zanabûn û zimanê xwe navek li Kurdan kirine. Heta serdema Kardukiyan gelekî nav li Kurdan kirine. Lê di serdema Kardukiyan de, êdî bi dokumentên nivîskî gotine; Kardox, Kardo,Karduk, Kardux…Ev gel di navbera gola Wanê, çemê Dîclê û çiyayê Zagros de jiyaye. Gotina Kurd ji bo gernasî û qehremaniyê bikar anîne. Nivîsara dîrokî ya yekemîn ya ku li ser Kurdan hatiye nivîsandin, ya Ksenofonê Yewnanî ye. Ksenofon B.Z. di 400-401-ê de, di Kurdistanê re derbas dibe û di pirtûka xwe ya Vegera Dehhezaran de behsa Kardukan dike. Ksenofon, ji welatê Kardukan re Karduka gotiye. Îro hemû dîrokvan hemfikirin, ku Karduk Kurd û Karduka jî Kurdistan bi xwe ye. Li gor nivîsîna Ksenofon, Karduka ji rojhilatê çemê Dîclê dest pê dikir, heta çiyayê Cudî û gola Urmiyê dida ber xwe.
Herweha li gor arkeolog û dîrokzanan, 10 hezar sal in, ku mirov li Kurdistanê dijîn. Li welatê Kurdan heta îro gelekî êrîş, koçkirin, bela û karesat pêk hatine. Lê, dîsa kurdan dev ji axa Kurdistanê bernedane. Li ser axa bav û kalên xwe jiyan e. Ji B.Z. heta îro, Kurd li Kurdistanê, bi navê curbe-cur wekî kom, êl, eşîret, mîrîtî, an jî bi navê dewletê hebûna xwe parastine.
Li gor hemû zimannas û dîroknasan zimanê Kurdî li gor tawangbarî û rêzimaniya xwe ji kok û binyata gruba van zimanên Ariyan e. Bêguman, hebûn û zelal kirina zimanê Kurdî û pêşveçûna wê wek zimanê miletekî serbixwe bi qûnax û dema dîroka ko ew tê re derbas bûye, tê girêdan.
Di 700 B.Z de, zimanê Kurdî-Medî wek zimanekî Hindo-Ewropayî cih girtiye. Li dora 150 salî bûye zimanê desthilatdariyê, ji (700-550) B.Z. Bandûra zimanê Arî li van zimanên hevjîn hebû, nemaze piştî hatina Med û desthilatdariya wê li herêmê. Bêdudilî, em dikarin bêjin: Zimanê Kurdî yê îroyîn zimanekî Hindo-Ewropayî, serbixwe ye. Zimanê Kurdî-Medî yê ko di 500 B.Z. ava bûye. Ew ziman zimanê ol, Rêbaz û desthilatdariya Medya bû. Diyar e, di vê demê de, zimanekî hevgirtî Gotî-Medî bê zarava domand. Ev zimanê hevgirtî Gotî- Medî li dora 1000 salî, ango ta bi sala 500 Z. dirêj kiriye. Bêguman, li gor çerxa dîrokê û piştî hilweşîna desthilatdariya navendî ya ramyarî , zimanê kurdî jî ber bi perçebûnê ve çûye. Nemaze piştî ko ketin bin desthilata fermandarên biyanî. Piştî vê qûnaxê, dema koçkirina xelkên herêmê destpê kir. Xelk ji cihê xwe bar kirin. Êl û hoz ji hev belav bûn. Xweristiya kurdistanê ya çiyayî pirtir ew êl, hoz û xelkên herêmê ji hev dûr xistin. Danûstendin di navbera wan de qut bû. Li piştê her çemekî an çiyayekî ji çiyayên kurdistanê zaravayek bi serê xwe peyda bû. Bi pêşveçûna demê re zaravayên herêmî pirtir û firehtir bûn.
Rewşa penaberiyê û rewşa hêmenên ramyarî, coxrafî, civakî û abûrî li kurdistanê, digel dijwariya têkiliyan, di nav êl û hozan de û tevlihevbûna hin êlên yekherêmê bi hev re çar zaravayên sereke peyda bûn. Nemaze di sala 1500 Z de, ev her çar zaravayên sereke ava bûn. Ew jî ev in:
Kurdiya Bakurî. Kurdiya Navîn. Kurdiya Başûrî. Kurdiya Goran.
Zaravayên Kurdî:
Di warê zaravayên kurdî de kevintirîn çavkanî Şerefnameya Şeref-Xanê Bedlîsî ye. Eşîr û civakên kurdan, Rûpel 15

Dûmahî : Xwendinekî Pişti 101 Salîya Lozanê

Hêzên herêmî yên dagirkerên Kurdistanê, her yek ji wan hatiye dorpêçkirin, rewşên xirab jîyan dikin, rejîma Sûrîyê lawaz ketîye û li ber têkçûnê ye, dewleta Tirkîyê ji encama polîtîkayên Erdogan bi krîzên sîyasî û aborî re rû bi rû maye, hewl dide ku xwe jê rizgar bike, lê ev zûbizûbûn pêk nayê, ancax bi guhartineke demokratîk û çareserkirina pirsgirêka kurd, dikare vê pêk bîne, rejîma Îran bi deh salan e ku di dorpêçê de ye, lêdanên Îsraîlê li Sûrîye û deverên din li dijî Îranê, ta astekê ew tengav kiriye, rewşa wê ji ya Tirkîyê xirabtir e, eger em bên ser Iraqê, em ê bibînin ku Iraq weke dewletekê, tu heybeta wê nemaye, em dizanin ku Iraq di bin wîsayeta Îranê de ye, di vê demên dawî de, Tirkîye jî hewl dide ku bi rêya sunîyên Iraq û Barzanî re li Iraq di biryara sîyasî de, serwer be, niha vê gavê yek bi tenê nikare şer bike, ev her çar dewlet-neteweyên statûkparêz hêza xwe di yekîtîya xwe de dibînin, lewma jî beramberî guhartinên ku dibe pêk bê, makanîzmeyên sêqolî û çarqolî dijî kurdan berdewam in, bi civînên Stana, Tahran û Enqere hewl tê dayîn ku pêşketin û guhartinên ku pêkane di doza kurd de bêne kirin, pêşî bigirin, lê ev dem derbas bûye, êdî nikarin ji leza tevgera kurd bi baskên xwe yê leşkerî û sîyasî kêm bikin û kurdan tune bikin, êdî ew dem derbas bûye û kurd ne kurdê berê ne. Bi Şoreşa Rojava û şerê dijî Daişê re, mijara kurd bûye mijareke navneteweyî, hêza HSD bûye yek ji hêzên herî bi bandor di şerê li dijî Daişê de ku cihê xwe di nava hêza Hevpeymanê ya heftî û du welatan de digire.

Ta niha xwendina Tevgera Azadîya Kurdistanê û Hêzên Rojavayê Kurdistanê ji pêşketinên li herêmê rû didin xwendineke rast bû, lewma di hem dema ku dikarîbûn li Şengal, Kerkûk û Rojava xwedî li kurdan derkevin û wan biparêztin, di heman demê de piştî sedsalî ji Lozanê gaveke bi kalîte di doza kurd ber bi pêş dan avêtin, piştî vê vegera ber bi paş êdî zehmet e, lê divê em vê jî bêjin ku beşekî kurdan ku nûnertîya xwe di ENKS û mala Barzanî de dibîn, xwendina wan ji pêşketinên ku li herêmê çêdibin re, şaş bû, hemû hesabên xwe wan li ser Tirkîyê, Rikberîya Sûrî ya Îxwanî ya ku dijmintîya kurdan dike bû, cihgirtina li cem dagirkerên ku rojane ciwanên kurd bi roj li kolanan didin ber guleyan û dikujin; çiqas rast e! Gelê kurd êdî ne yê berê ye, zana bûye ku xeta xîyanet û berxwedanê ji hev derdixe. Eger kurd berjewendîyê teng û malbatî bidin alîyekî û yekîtîya neteweyî ji xwe re bingeh bikirin, nebin dûvik û nekevin xefkên dijmin, kurd bi ser dikevin, tiştê ku Lozanê derbas bike yekîtî û yekrêzîya kurdan e, danîna nakokîyan li alîyekî ye, divê kurdên her parçeyî bên cem hev, nêrînên xwe bikin yek û li ser çi li hev dikin û ji welatê ku ew di nav de ne çi dixwazin? bila ew xalên li ser li hev dikin bibin xetên sor ku çi dibe **bila** bibe nabe ku ew xet bêne derbaskirin, di asta giştî ya Kurdistanê de, birêz Ocalan ji bo yekîtîya kurdan 5 perensîbên ku dîyar kirine: “Komgra Neteweyî bê lidarxistin û her çîn, beş, kesayet, partî û rêxistin cihê xwe di nava de bigirin – Desteyeke Rêbeber ya kongre hebe, ew berpirsyar e di ber xebatên partîk-polîtîk û xebatên dîpolomasî ên hundir û derve, eknomîk, civakî û çandî weke sazî bimeşîne – tevahîya hêzên xweparastinê yên çarparçeyan di bin sîwaneke hevpar de dike yek – desteyeke têkîlîyên derve bê avakirin, têkîlîyê bi dewlet û civakên sivîl re çêbike“. Eger ev perensîpên ku birêz Ocalan pêşkêş kirine, bingeh bêne girtin êş û azarên kurdan ên sedsalan çareser dibin.

Me li jor da zanîn ku guhartin di helwestên serdestîya Cîhanê de beramberî kurdan çêbûye, Emerîka bi hêsanî ji Sûrîyê nakêşe, mayîna li vir bi ewlekarîya xwe ya neteweyî ve girê dide, mînîmzekirina Îran û parastina Îsraîlê di rojevê de, hatina serfermdara erkanê Emerîk ji herêma Bakur û Rojhilatê Sûrîyê re, dawîanîna nîqaşên mayîna hêzên Emerîkî di nava sazî û dezgehên Emerîk de dawî li qonaxekê anî, vê gavê pêdivîya Emerîka bi kurdan heye, kurd karîgerê guhartinê ne, Şoreşa Rojava û destdanîna ser herêman, dê dewleta Sûrîyê neçar bike ku guhartinê pêk bîne, neçare dewlet di majara nenavendîbûnê gav bavêje, her wisa ji bo Tirkîyê jî, çareserkirina pirsgirêka kurdî li Tirkîyê û pejirandina Xweserîya Demokratîk li Bakurê Kurdistanê, dikare Tirkîye ji wê krîzê derbixe; ne tiştekî din, heta xwînrijandina hundir neyê rawestandin, Tirkîye ne pêkane bi ser xwe ve were, lêçûnên van operasyonên ku Tirkîyê li dij kurdan li dar dixe, aborîya Tirkîye anîye ber sifrê. Bi vê mijarê ve girêdayî, birêz Ocalan di noteke hevdîtinên sala 2009 de gotibû: “Mustefa Kemal bi derketina ji Amasyayê giştînameyek weşand ku tê de got ku kurd û Tirk têkoşîneke hev dimeşînin, dewleta ku were avakirin jî wê dewleta her du gelan be. Di makezegona 1921 de hin biryar –zagonên ku dipejirînin ew e ku xweserîyê bide gelên ku hatin bicikirin. Birêz Ocalan dide dîyarkirin ku “Lozana civakî çêbibe wê pirsgirêk çareser bibin“ komara heyî kêm maye, ev komar bê demorkratîkirin, komar yekalî maye, Lozana ku hatibû çêkirin Lozana lihevkirina dewletan bû, civak tê de nîne, Peymana Lozanê xwişk û biratîya gelan ji holê rakiriye, netewe kirin dijminê hev, divê ev ji nû ve bê sererastkirin. Îran ketîye ferqa wê yekê ku ew armanc e, lewma hewl da ku bi daxuyanîya Mesûd Bizîşkîyan derbarê kurdan, kurdan ber bi xwe bikêşîne. Kurd weke sedsala 20. Weke berê jîyan nakin, kurdan ew qonax li paş xwe hiştin. Bi şerê Daişê û avakirina Şoreşa Rojavayê Kuristanê, kurdan mora xwe li sedsala 21. Dane, lewma jî kurd avakirina Rojhilata Navîn ya nû de hene û dê maf û statyûya xwe bistînin, kes nikare li pêşîyê bibe asteng, kurd bernamzetên ku pêşengtîyê di asta Rojhilata Navîn de bikin, felsefeya Neteweya Demokratîk, îro bûye realîteyek li Bakur û Rojhilata Sûrîye, ev altirnafê dewlet-neteweya li ber têkçûnê ye.

Jêder : Malpera Navenda Rojava ya Lêkolînên stratîjî

Xwendinekî Piştî 101 Salîya Lozanê

Tê zanîn ku Şerê Cîhanê yê 1. zemîna peymana Saykis-Picot danî û herêma Rojhilata Navîn parçe kir, bi Peymana Firsay welatên di şer biserketî, Rojhilata Navîn li gor berjewendîyên xwe herêm li xwe par ve kirin, bi dehan dewlet û dewletokên qaşo serbixwe yên xizmeta berjewendîyên dewletên di Şerê Cîhanê yê 1. De serketî hatin avakirin, bi navê tirkan û ereban dewletên weke Tirkî, Sûrî û Iraqê li ser axa dîrokî ya kurdan hatin avakirin û bi tu awayî gelê kurd ê ku bi hezarên salan li ser vê xakê jîyan dike, li ber çavan negirtin. Peymana Lozanê (1923) ya kurd danmendele kirin; yek ji encamên li hevkirinên hêzên navnetewî ye û di pileya yekem de ji doza kurd ew berpirsyar in, dewlet-neteweyên bi destê hêzên derve li herêmê hatin avakirin gel û civakên herêmê bi hev dan kuştin û herêm kirin gola xwînê û krîz kûrtir kirin.

Peymana Lozanê yek ji tirajîdîya sadsalê ye ku kurd sedsalî bi paş xistin, çawa ku bi Lozanê kurd di alîyê bedencografî de hatin parçekirin, her wisa ji alîyê dil û mejî ve jî hatin parçekirin û di çand û ziman de jî hatin parçekirin, lewma jî îro hejmareke mezin ji kurdan biyanîyê ziman, çand û nasnameya xwe bûye, bi mîlyonan kurdên ku di nava destarê çewsandinê de hatin hêran; bûn tirk, ereb û faris. Beşekî kurdan ji kurdînîya bav û bapîrên xwe direvîya, ji cil û bergên xwe şerm dikir, heyranî, tirkbûn, erebûn û farisbûn bûye. Gelo li kîjan devera dunyayê neteweyek du alfabayan hemwext bi kar tîne? Ev biyanîbûna di beşekî kurdan de pêş ketîye, bi vê mijarê ve girêdayî civaknasê Tunisî “Ibin Xeldûn“ dibêje: “kesên binketî her dem di dirûşm, cil û berg, bawerî, hemû rewş û karên xwe de, hez dikin li ser şopa yê ew bin xistîye tev bigere û weke wî bike“. Di nava kurdan de ji vî cûrê mirovan pir in, ji cewher û rastîya xwe derketine, bi wê tenê jî nakin ku ji wê zêdetir pê de diçin û beşek ji wan ketine xeta xîyanetê ku li kêlek dijmin li dijî gelê xwe di nava tevgerê de ye, gotinek heye ku di nava civaka kurd tê gotin: “kurd kewê gozel in, dixwîne qewmê xwe dixe dafikê“. Lozanê kurd bêmaf û bênasname hiştin, kurd bêstatyû hiştin, kurd rûbirûyî polîtîkayên jinavbirina fizîkî, çewsandin û koçberkirina bi darê zorê kirin. Eger em giştî Kurdistan di asta çarparçeyan de bigirin dest, em ê bêjin zêdeyî mîlyoneke kurd piştî şerê Cîhanê û Peymana Lozanên, bûne qurbanî, zêdeyî dehmîlyon kurd ji cih û warên xwe koçber bûne û bi dehhezaran gund hatine şewitandin.

Di nava sed û yek salî de. li çar parçeyên Kurdistan ê çi bi serê kurdan hat? Gelo di nava sed û yek sal piştî Lozanê di rewşa Cîhanê û herêmê de çi guherî ye? Çi guhartin di rewşa kurdan ya sîyasî û leşkerî de çêbûye. Gelo kurd di sedsala 21. De dê mafê xwe bistînin? An sedsalek din kurd wê di bindestê van çardagirkerên Kurdistan ê bimînin? Lozan wê çawa bê derbaskirin?

Piştî avabûna Komara Tirkîyê, doza kurd hat mandelkirin, polîtîkayên qirkirin, ewsandin û koçberkirinê li çarparçeyên Kurdistan ê dest pê kir, pilana "Îslahata Şerq" li Bakurê Kurdistan ê dest pê kir, li Rojavayê Kurdistan ê bi serjimara 1961 re nasname ji kurdan hat kişandin, kembera erebî ket merîyetê, li raqê qonaxên enfal û kîmyabaranê yek li pey yekê dest pê kir. Di dema şerê Cîhanê û piştî Peymana Lozanê di nava 100 salî li giştî Kurdistan ê, zêdedeyî mîlyoneke kurd bûne qurbanîyê vê peymanê, zêdeyî 10,000 gund hatine şewitandin û rûxandin, zêdedeyî 10 mîlyon kurd jî koçber bûne, bi kêmanî 10 mîlyon kurd hatine pişaftin. Dewleta Tirk roleke sereke di danîna tewrî, piroje û pilanên tunekirina kurdan de leyîstîye, Pilana "Îslahata Şerqê" cara yekem di sala 1925 ji alîyê Tirîyê ve ket merîyetê. Di nava her çardagirkerên Kurdistan ê de hemahengîyeke xurt ya ewlekarî û saloxgerî bi dirêjîya 100 salî berdewam e, Peymana Saad Abad 1(937) di navbera Tirkî, Îran, Iraq û Afganistanê de ya bi serpereştîya Berîtanya; her çendî di teşe de li dijî Rûsya bû, di heman demê de dijî kurdan bû jî, dîsa Peymana 1932 ya di navbera Tirkîyê û Îranê de derbarê têkbirina serhildana Araratê ku Îranê rê da Tirkîyê ku derbasî nava xaka wê bibe û ji paş ve li şervanên kurd bizivire û wan tune bike, di sala 1963 de jî artêşa Sûrîyê (Lîwaûlyermûk) di pêşengtîya Fehd ElŞair çû hawara Ba`asîyan ku bi artêşa Iraqê re bû alîkar û li dijî tevgera kurd bû, di sala 1982 dijî Partîya Karkên Kurdistan ê Peymaneke di navbera Iraq û Tirkîyê de hat çêkirin ku rê dide hêzên Tirkîyê ku 5 km xaka wê derbas bike, di 1998 jî Peymana Edenê di navbera Sûrîye û Tirkîyê de çêbû, rê ji Tirkîyê re hat dan ku xaka Sûrîyê derbas bike û tevgera kurdî tune bike, bi vî rengî dalmendelkirina kurdan di Lozanê de, hêz û **wêrekî** daye hêzên dagirkerên Kurdistan ê ku hemû hêza xwe bi ser kurdan de bişînin û wan tune bikin, kurd bûn qurbanê berjewendîyên serdeatîya Cihanê ku di mijar kurdî de, ew di pileya yekem de berpirsyarê derbarê tiştê bi serê kurdan tê ne.

Pergala Cîhanê ya sîyasî û aborî ya ku di sedsala 20. De hatibû çêkirin, îro tê kçûye, pergala sermayedar bixwe jî di krîz û buhraneke kûr de ye, bi destwerdanê li ser dewletên erebî û şerê Sûrîye, Ukrayînya û şerê Xeze û Hemasê, hewl tê dayîn ku pergaleke nû ya sîyasî û aborî bê avkirin, dewlet-neteweyên ku ji alîyê serdestîya Cîhanê ve hatibû avakirin, têkçûna wan piştrast bû, dewlet-neteweya bi ramana yekziman, yekal û yeknetewe, Rojihilata Navîn kir gola xwînê, piştî ev dewlet-netewe bi kok bûn, êdî nema weke berê xizmetê ji benîyên xwe re dikin, dem dem li gor xwe jî tev digerin, lewma jî Rojhilata Navîn li ber guhartinê ye.

Ji çarîyeka sedsala 20. û nexasim **van** salên dawî û vir de, tevgera kurd pêngavên baş avêtin, Tevgera Azadîya Kurdistanê, guhartineke hişmendîyê di civaka kurd de pêk anî, ev guhertin û bandorkirin piştî Şoreşa Rojavayê Kurdistanê, bi serhildana Jîna Emînî a bi pêşengtîya jinên Rojhilatê Kurdistanê û dirûşmeya “Jin, Jîyan, Aazdî“ ku wergerîya serhildana tevahîya jînên Îranê û jinên Cîhanê; berdewam kir, kurd îro karîgerê guhartin û demokratîkirina dewletên herêmê ne ku ew ê vê pêşengtîya xwe berdewam bikin.

Piştî sedsalî di polîtîkaya hêzên serdestîya Cîhanê de, guhartineke qismî beramber gelê kurd tê dîtin, ev guhartin ji dehsalên dawîya sedsala 21. Ve dest pê kiriye, avabûna statyûya Herêma Başûrê Kurdistanê, her wiha avabûna Xweserîya Demokratîk ya Bakur û Rojhilatê Sûrîye, nimûneyeke jê ye ku vîtoya li ser Kurdistanê hatîye şkandin, bêguman ev vîto ji ber xwe de nehat şkandin, berdêlê pir giran hatin dayîn heta ku ev guhartin pêk hat, bi dehhezan şehîdan xwîna xwe li ser vê xakê rijand. Piştî vê hêzên serdest nikarin kurdan nedîtî bibînin, ji ber kurdan bi hêz û qurbanîyên ku pêşkêş kirin, xwe kirin hejmareke girîng ji girêfta Rojhilata Navîn. Ji hemû deman zêdetir niha mijara kurd li ser maseya hêzên mezin e.

Rûpel 17

Bîreweriyên "Mam Li Şam" bi deng tên weşandin

Mam Li ŞAM, behsa dîroka nebihîstî û ya pir şanazî û birumet ya rewanşad (Mam Celal Talebanî) û hewl, xebat, tekoşîn û rola wî ji salên 1950`an û şûnve dike.

Mam li Şam, behsa serhildana bizava Kurdî li Rojavayê Kurdistanê û damezrandina yekemîn partiya Kurdî li ew parçeyê Kurdistanê dike.

Pirtûka "Mam Li Şam" ji nivîsîna nivîskar (Elî Şemdîn) û wergêrana Goran Fethî ye bo zaravayê Soranî ku bi 50 xelekan rojane wê di radyoya Dengê Gelê Kurdistanê were weşandin.

Xelekên gotarên "Mam Li Şam" bi zaravayê Kurmancî jî li ser malpera Xelatê **(xelat.org)** hatiye weşandin û hûn dikarin bixwînin , her weha wê di dema pêş de jî bi awayê 3`ê pirtûkan bi erebî û herdu zaravayên Kurdî (Kurmancî – Soranî) were çapkirin.

Efserekî Kurd li Brîtanyayê bawernameya Serfermandariyê wergirt

Efserekî Kurd bawernameya Fermandarî û Serfermandariyê ji Koleja Mîrîtiya Yekbûyî ya Brîtanya Mezin bidest xistiye.

Serheng (Dana Celal) efserekî kurde û xwediyê du bawernameyên masterê di warê leşkerî û hunerên berevaniyê de li Koleja mîrîtiya Brîtanyayê, ku bilindtirîn pileya leşkerî ye.

Dana Celal ji rojnameya (Kurdistanî Nwê) re ragihandiye û gotiye: “Perwerdehiya di warê leşkerî û di asta pêşketî de gelek giringe. Ji ber ku emê bi zanyarî û nerîneke cuda vegerin Kurdistanê, hêvîdarim ku eger ev şerefa han bi me hat dayîn, bi vê zanînê emê xizmeta welatê xwe û hêzên Pêşmerge bikim.

Dana Celal Seîd ji dayîkbûyê bajarê Silêmaniyê ye û derçûyê kolêja yasa û ranyarî ya beşa yasa ye li zanîngeha Selahedînê ye û kolêja leşkerî li Qelaçwalan temamkiriye, her weha master li yasa li zanîngeha Florîda a Amerîkî wergirtiye herî dawî li wezareta Pêşmerge a Kurdistanê kar kiriye û berdewame di xizmeta xwe de.

Pêşverû

Siyasî . Çandî . Gîştî

Rojnameyeke Mehaneye ji Aliyê Nivîsgeha Ragahandina Efrînê ya Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê Tê weşandin Hejmar* (82) *Tebax 2024 Z - 2636 K

Dengê Pêşverû

Yazde sal di ser Rojnameya Pêşverû re

Piştî derbasbûna salekê di ser qeyrana Sûrî re rewşa gelê kurd û tevgera wî ya rêzanî û rewşa herêmên kurdî derbasî qûnaxeke din bû , herwiha bandorên neyênî yên wê qeyranê hêdî hêdî li herêmên kurdî jî xuya kirin wek qutbûna çûn û hatinê û girtina rêkê di navber Efrîn , Heleb û herêmên kurdî de û qutbûna kehrebe û alavên pêgihînê , van sedeman zehmetî di gihandina ragihandina partiyê de li seranserî herêmên kurdî peyda kirin , û ji ber pêwîstiya karê rêzanî û xebata partîzanî serkirdayetiya Efrînê ya "Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê" biryarek standin bi derxistina "Rojnameya Pêşverû"
Di Gulana sala 2013an de hejmara Yekem ji Rojnameyê bi derket û ket nav destê dost û hevalan. Rêketina "Rojnameya Pêşverû" dergeheke nû ji nerîn û derbirînê re vekir û hêviyên dost û hevalan di xebata partîzanî de bilind kirin û bi germahî xwendevanên wê pêşwazî dikirin , rûpelên wê dipelandin û bi hûrbînî mijarên wê yên cihêreng û dagirtî dixwendin
Di destpêkê de ew ji heşt rûpelan pêk hatibû Heft rûpel bi Zimanê Erebî û rûpelek bi Zimanê Kurdî bû. Piştre hêdî hêdî firehtir , geştir û zengîntir bû. Ji sala 2015an de heya bi vê kêliyê "Rojnameya Pêşverû" ji Bîst rûpelên dagirtî dikeve nav destên xwendevanên xwe. Naveroka wê ji Nûçe , Gotar , Hevpeyvîn , Kesayetiyên hejmarê , Rewşa jina kurd , Dîrok , Çand , Fêrkirin û rastkirina zimên , Peywendiyên Kurdistanî , Belge , Efrîn di bin dagîrkeriyê de , pirtûka hejmarê , û Doza Kurdî di Rojnamegeriya Cîhanî de... hwd
"Rojnameya Pêşverû" bi rêbaza xwe ya rêyalîst û hişmend , bi wê logoya xwe ya kesk ku reng ji rengên keskiya zêtûnên Çiyaye Kurmênc û xwezaya Kurdistanê hemerengî daye xebata ragihandin û pirtûkxaneya kurdî. Hêjayî gotinê ye ku derxistin û çapkirina Rojnameya Pêşverû li Efrînê bi derdiket û (3000) kopî dihat çapkirin û belavkirin.
Lê piştî dagîrkirina Efrînê ew demeke kurt hate rawestandin û piştre ji ber rewşa awarte ya ku li herêma Efrînê û ji ber girîngiya wê di nav hevalên rêxistina Efrînê de nivîsgeha rêzanî û serkirdayetiya partiya me biryar dan ku divê "Rojnameya Pêşverû" rêveçûna xwe berdewam bike û ji wê rojê de heya bi vê kêliyê "Rojnameya Pêşverû" di xebata xwe de berdewame û rolekî wê pêşeng û çalak di nav ragihandina partiya me de heye.

Desteya Sernivîser a Rojnameya Pêşverû

Şandek ji "Partiya Pêşverû" li Helebê beşdarî semînereke rêzanî dibe

Di dîroka / 27 / 7 / 2024an de bi amedebûna hejmarek ji partiyên siyasî û bi vexwendina rêveberiya Malbenda Helebê ya Rewşenbîrî Şandek ji partiya me "Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê" semînereke rêzanî bi navnîşana "Bêtara Til Eran û Til Hasilê" beşdar bû.
Ji aliyê xwe ve mamoste Hişmend Şêxo endamê komîta navendî ya partiya me balkişand ser pêşhatên ku li vê dawiyê çêbûne û bi taybetî guherînên ku di helwesta Dewletên Erebî de çêbûne û vegera Sûriyê nav kombenda dewletên Erebî û rola Rûsiya û navbênkariya Iraqê sebaret bi vegerandina peywendiyan di navber Turkiyê û Sûriyê de.
Herwiha balkişand ser rewşa tevgera rêzanî ya kurdî û divêtiya tiştê ku ji tevgerê tê xwestin ji beşdaran şirove kir û wisa got :
Di destpêkê de em spasiya malbenda Helebê ya rewşenbîrî dikin li ser vexwendin û lidarxistina vê semînerê
Birayên hêja : Dema ku em rûpelên dîrokê dipelînin û qûnaxên ku gelê me û tevgera wî ya rizgarîxwaz dinirxînin xuya dibe ku dewletên Kurdistan parçe kirine hemû kêşe û nakokiyên didin aliyekî û li ser gelê kurd dibin yek ji bo bidawîkirina mafên gelê kurd û pişaftina doza wî ya netewî û lawazkirina tevgera rêzanî ya kurdî , û zor mixabin kurd jî bi nakokiyên xwe mijhûlin û şerê hev dikin
Lewre ji hemû aliyên tevgera rêzanî ya kurdî , rewşenbîr û kesayetiya niştimanperwer û welatparêz tên xwestin ku lêvegereke gîştî ji helwestên tevgera xwe ya rêzanî re bikin û divê kar ji danheva mala kurdî re were kirin bi armanca avakirina biryara rêzanî ya kurdî li Sûriyê û biryardan bi mizgotineke rastbîn û rêyalîst daku daxwazên me ji aliyê hemû civaka pêkhateyên Sûrî were pejrandin.

Rojnameya Pêşverû

Pêşverû

Siyasî . Çandî . Gîştî

Ev Rojname Rojnameya we ye
Ev Deng û Hawara we ye
Zengîn bikin bi gotarên xwe
Ev xewn û Hêviya me ye
Hişmend

E.Mail: altekedome-efrin@hotmail.com Facebook التقدمي عفرين